Hişyar bin!

MIROVAHÎ DI NAVA T'OR'A DEK' Û DOLABÊN NAVDEWLETÎ DA TÊK DIÇE.

Ezîz ê Cewo

Mirov têgihîştina pirsê ji k'u destpêbike?

Ji berê va hatye gotin, ku şer'ên nû wê demê destpêdibin, dema mirovahî dersên dîrokê jibîrdike.

Di vê da r'astîyek heye, lê ne hemû!

Qey bibêjî, di serdemên nû û nûtirîn ên dîrokî da kêmasîya zanebûna dersên dîrokê nemaye: *qey bibêjî, dîroka mirovahîyê ji sêrî heya binî hatye nivîsîn û t'omarkirin (û, wek ku tê gotin, dîroka mirovahîyê hem jî, ji dîroka şer'an pêk tê!), li ser bingeha wê jî, di dibistanan heya zanîngehan da nivşên cuda p'erwerdeya dîrokê dibînin û fêr dibin – bi hemû serdemên wê va – ji demên nêolotîk heya îro…*

Û, dîsa qey bibêjî, her tişt li ber ç'avan e!

Lê, na! Yek e, şer' ji jîyana mirovahîyê kêm nabin. Her demek a nû bi xwe r'a şer'ekî nû tîne. – Çima?

Helbet, ev pirs bêhtir felsefîk û hrêtorîk e!

Her kesek dê bibêje – lewra ku mirovahî dersên dîrokê jibîrdike! – Belê, ev jî r'astîyek e, lê ne hemû.

Her şer'ek armancên xwe hene, û ew armancana bi demê r'a her bi şêwazî hatine û tên guhar'tin, lê r'astîya wan heman tişt e – *dagerkerî, kuştin, wêranî û t'alan, zulm û zordarî, bindestî û mijovdarî, stemk'arî û dawîya dawîyê – mêtîngerî!* …

Şer' îro jî, wek berê, her amûreke e – ji bo pêkanîna wan armancan!

Û bi xwezayî, t'erefê dijberî vî şer'î jî heye – ew Şer'ê R'izgarîyê ye, Têk'oşîna li dijî wan hemû armancên dijmirovî yên vî şer'î – *li dijî dagerkerîyê, zulm û zordarîuê, kuştin û t'alan û wêranîyê, li dijî bindestî, stemk'arî û mijovdarîyê, li dijî mêtîngerîyê*…

Û ya ku pêşk'evtina dîrokê û mirovbûna mirovahîyê jî msoger dike, hema ev têk'oşîn e – *Têk'oşîna r'izgarîyê, Têk'oşîna dijî zulm û zordarîyê ye!*

Û dîroka mirovahîyê jî ji serdemên di navbera şer'an da pêk tê – ji navberên biç'ûk, an mezin!

Eger serdema sedsalên navîn û berî wan di cîhanê da şer'ên herêmî yên teng û bi sînor (ên lokal) di navbera p'adişahtî û mîrtîyan da pêk dihatin, lê ji sedsala XIX û vir va, dema dewletên gewre bi r'êya mêtîngerîyê sînorên desthilata xwe berfirehtir dikirin, ji bo ku desthilata xwe bigîhînin asta cîhanî û r'ewa bikin, ji hêla wan va wisa jî r'ê û r'êbazên dinê hatine û îro jî tên k'aranîn: peymanên navnet'ewî, yên wek ên Sayk's-Pîko (1916) û Lozanê (1923) a ku, qaşo, ya Aştîyê tê navkirin, lê di r'astîya xwe da ew ya bêdadîya dîrokî û r'ewakirina sûcên dewletên gewre yên li dijî mirovahîyê bûye!

Û p'ir'ê caran jî dek' û dolabên cuda (komplo) p'arç'eyekî van peyman û hevhatinan bûne.

Îro, eger em bibêjin, ku peymanên Sayk's-Pîko û Lozanê bûne p'ara dîrokê, emê xwe bixapînin!

Bala xwe bidinê, hema bi dîrokî derfet'ek derk'et holê, ku, hîç nebe, bi şêwazî be jî, di wan xerîte, xet û xêzên wan peymanan da guhar'tin pêk bên, r'ûpelên wan peymanan, ên ku di xewa dîrokî da bûn, lipitîn, peyhatîyên xwedîyên wan ên di pişt p'erdeyê da k'etin nava t'evgerê, û 5-ê r'êbendana 2026-an di P'arîsê da bazarîyek a siyasî pêk hat: hevpeymanîyên k'urdan ên di têk'oşîna dijî têr'ora navnet'ewî da pişta xwe dan wan, bi HTŞ/DAÎŞ-a

ç’avkanîya wê têr’orê r’a li hev civyan, wek ku di nav gel da tê gotin, qet û bir’a xwe bi wê r’a kirin yek û k’urd r’adestî bextê DAÎŞ-a duh HTŞ-a îro û r’êjîma faşîst a T’irkîyayê kirin – li dijî hemû pîvanên mirovahîyê û mirovbûnê, li dijî hemû r’êgezên p’êwendî û peymanên navnet’ewî, her bi hesabekî – bi hesabê berjewendîyên hişk û zuha, gor wan kevneşopîyên mêtîngerîyê, yên ku ew li ser pêkhatine û gihîştine r’oja îroyîn …

Û bi bir’yara vê bazarîyê, piştî komploya navnet’ewî ya 15-ê sibata 1999-an a dijî r’êberê gelê k’urd bir’êz Ocalan (bixwîne – dijî gelê k’urd û azadîya wî!) dest bi p’êla duyem a komploya navnet’ewî bû – 6-ê r’êbendana sala 2026-an hêzên HTŞ/DAÎŞî û yên r’êjîma faşîst a T’irkîyayê li dijî t’axên k’urdan ên Eşrefîyê û Şêx Meqsûdê yên bajarê Helebê destbi êrîşên t’evkujîyê kirin – bi bir’yar û destûra hêzên hevpeymanîya navnet’ewî ya dijî DAÎŞ-ê, di bin ç’avdêrî wan û di bin pozê wan da…

Û dengekî lewaz jî ji wan derneket, negotin – rawestin, hûn çi dikin, ma ne, ev t’evkujîya gelê medenî ye!? Dikaribûn, lê negotin, lewra ku wan bi xwe bir’yara wê di bazarîya 5-ê r’êbendana 2026-an da dabû – vekirî, û li ber ç’avê cîhana ku xwe şaristanî dihejmêre, ev tevkujî pêk hat.

Li vira dêmikê (maske) evê, xwedêgiravî, hevpeymanîya navnet’ewî k’et, û r’ûyê wan ê r’astîn li ber cîhanê vebû.

Armancên vê komployê bi van hovîtî, bêdadî û bêbextîya mirovî bi sînor nebû. Piştr’a xwestin gelên k’urd û ereb bînin hember hev û şer’ekî di navbera k’urd û ereban da t’evdaxin, ên ku bi hêzên hevp’ar (HSD) R’eqqaya P’ayt’exta DAÎŞ-ê, Dêrezor û navçeyên dinê ên ereban ji DAŞÎ-ê r’izgarkiribûn, û yekîtîyek di nava wan da pêk hatibû… Û ev yek r’êberê gelê k’urd bir’êz Ocalan jidûrva dît û ji girava Îmralîyê hêzên k’urdan hişyakirin… Û HSD-ê hêzên xwe ji herêmên ereban vek’işandin … Ev bi serê xwe pirseke p’ir’ girîng e, ya ku paşê ji hêla T’evgera Net’ewî va dê bi hûrbînî bê nirxandin û wat’edarkirin!

Lê hema naha, vê demê mirov di vê derbarê da dikare çi bibêje – ev baş bû, an xirab? – Ya sereke, metirsîya şer’ê navbera gelên k’urd û ereb ji holê r’abû, helbet, eger ji vir û pêva jî hewlên van hêzan ên provokativ nedomin. Her çi jî hebe, divê di vê pirsê da p’ir’ hişyar t’evbiger’in. Paşê jî r’êjîma faşîst a T’irkîyayê û hinek dewletên ereb ên hevk’arên wê dê hewl bidin, ku şêx û serekên hinek eşîrên ereban, ên ku bi T’irkîyayê û hêzên derva va girêdayî’ ne, tûj bikin…Lêbelê, ev salên têk’oşîna hevp’ar a li dijî DAÎŞ-ê û jîyana bi hev r’a di Herêma xweser da ç’avê erebên wan herêman jî li ser gelek r’astîyan vekirye.

Hêzên mêtîngerîya navdewletî ji bo xatirê mafên gelên bindest nehatine herêmê, pêdivîya wan bi k’aosekê heye, k’aos, a ku di bin kontr’ola wan da be, ku ew bikaribin ewê gor berjewendîyên xwe r’êvebibin…

Lewra jî komplo didome – û p’êla vê komployê ya sereke, û ya here bi sûc, a dijmirovî dorpêç’a Kobanîyê ye – Kobanîya leheng, bajarê r’ûmeta mirovahîyê, ya ku li dijî êrîşên DAÎŞ-ê li ber xwe da û ew têk bir. Û ev êdî mehek e, ev bajar bê av û êlêktrîk, dû-derman û xurek dimîne, r’êjîma T’irkîyayê alîk’arîya ji Bakûrê K’urdistanê ji bo Kobanîyê diçe, li ser sînor vediger’îne. Di vî bajarî da zar’ok ji birçîya dimirin (û ew jî di sedsala XXI da!). Û ev hemû li ber ç’avê hêzên hevpeymanî û di bin kontrola wan da pêk tê! Îro Kobanî jî, wek Lênîngradê – dema şer’ê Yekîtîya Sovêtê yê dijî faşîzmê. Wê demê dorpêç’a Lênîngradê 872 r’ojan domya ji 8-ê r’ezbera 1941 heya 27-ê berfanbara 1944-an. Eger wê demê Lênîngirad di dorpêç’a faşîstan da bû, îro Kobanî di dorpêç’a HTŞ/DAÎŞ-ê, r’êjîma faşîst a T’irkîyayê û hevpeymanîyên k’urdan ên duh da dizêre…

Dibe ku hinek bipirsin – a DAÎŞ-ê û r’êjîma T’irkîyayê em tê gijîştin, lê ewên ku, xwedêgiravî, hevpeymanîyên kurdan bûn?

Bersîva vê pirsê bi şêwazên cuda di nava r’êzek r’ayedar, r’ojnameger, pispor û şiroegeran da diger’ya, lê kesekî bawer nedikir. An nedixwastin bawer bikin?!

Li vir û wir dihate gotin, ku DAÎŞ projeyek a navdewletî ya r’ojavayî ye, bi serokatîya DYA, ku ew hatye sazkirin, ji bo ku di Herêma R’ojhilata Navîn da k’aosekê sazbike, ya ku ji hêla wan va bê r’êvebirin, ji bo ku vê herêmê jinûva di nava xwe da dabeş bikin, ji ber ku ev dewletên piştî Lozanê bi sûnî hatine sazkirin, zêde serbixwe bûne, ji bin kontrola xwedî-

yên xwe derk'etine…

Û, weha, xwedîyên wan hatine, wan ceza dikin, û hed û sînoran ji wan r'a datînin. Naha jinûva wan neç'ar dikin, ku ew veger'in û stuyê xwe bidin bin nîrê mêtîngerîya navdewletî.

Lê gelên herêmê yên bindest, bi t'aybet jî, gelê k'urd, ê ku bi lehengî li dijî DAÎŞ-ê têk'oşyaye? Ya wan jî – dê di bin kontrola hêzên hevpeymanî (bixwîne – yên DYA!) û di bin fişar û êrîşên DAÎş-ê û r'êjîma faşîst a T'irkîyayê da mafên wan, ên ku wan bi xwe destanîne, dê gav bi gav, p'arçe bi p'arçe bên sînordarkirin, û dê evê wek qencî û dilovanîya xwe (ya mêtîngerîyê) bidin xuyan.

Wisan e, dertê holê, ku hevpeymanîyên r'astîn ên DYA û hevk'ar û hevalbendên wan ên r'ojavayî HTŞ/DAÎŞ û r'êjîma faşîst a T'irkîyayê bûne, ne ku ew, ên ku di şer'ê li dijî wê da xwîna xwe r'êtine!

Û tiştekî balk'êş bi vê boneyê!

Destpêka berfanbara sala par (06–07.12.2025) bi înîtsîatîva Partîya DEMê di bajarê Stambûlê da konfêransa navnet'ewî ya "Aştîî û Civaka Demokratîk" pêk hat. Em jî hatibûn vexwendin, û me li wir axavtinek jî pêşkêş kir... Piştr'a, êvarê, dema me amedek'arîya xwe dikir, her'in mêvanxaneyê, û li derva benda otobûsan bûn, mêvanek nêzîkî me bû û got, ku dostekî wî yê t'irk jî axavtina me guhdar kirye û dixwaze me slav bike û du gotinan ji bo me bibêje. Ew camêr nêzîk hat, destê xwe dirêj kir, me dsetê hev guvaşt, û ew veger'ya ser biraderê k'urd û piştî çend gotinên xweşbînîyê lê zêde kir: "... Bibêje r'êzdar, eger me nizanibûya, ku DAÎŞ ji hêla hêzên derva va hatye t'evgerkirin, ji bo ku wê li dijî herêmê k'arbînin, dibe ku em jî bi wê r'a bibûna yek û li dijî mêtîngerîya navdewletî bitêk'oşyana!" ...

Bi r'astî, wê demê em t'am tênegihîştin, k'a ew camêra dixwaze çi bibêje, lewra ku wê demê em heya dawîyê bi bawer bûn, ku hêzên hevpeymanîya navnet'ewî li dişî DAÎŞ-ê têdik'oşin, ne ku wê ji bo armancên xwe yên mêtîngerîyê k'ar tînin...

Paşê, hê derng, dema me bi ç'avekî nû li van bûyerên piştî 5-ê r'êbendana 2026-an nihêr'î, me dît, ku bi r'astî jî, hem êrîşên ser t'axê Eşrefîyê û Şêx Meqsûdê, hem ên ser R'eqqayê û Dêezorê, hem jî dorpêç'a Kobanîyê ne t'enê û ne ewqas ên HTŞ/DAÎŞ-ê û r'êjîma faşîst aT'irkîyayê ne, çiqas ên Hêzên Hevpeymanîya Navnet'ewî (bixwîne: Hêzên Mêtîngerîya navdewletî!).

Berbi watedarkirina pirsê va!

Baş e, ku t'erefekî dinê yê Amêrîkayê jî heye, gelek dot û lawên hêja ên vî welatî dost û dilxwazên gelê k'urd in, û dengê xwe ji bo piştgirîya R'ojava bilind dikin. Hema, heya ew dengê xwe bilind dikin, heya ku ew ji bo girtina hinek bir'yaran binnûsan (îmza) berev dikin, gelê Kobanîyê di dorpêç'ê da bînç'ikyaî dibe, zar'ok ji birçîya dimirii. Û evê dorpêç'ê k'ê r'ewa dike û pêk tîne? – Helbet, r'êvebirîya HTŞ/DAÎŞ-î ya demkî ya Şamê û r'êjîma faşîst a T'irkîyayê... Lêbelê, ev merivkujana hêza xwe ji k'u digirin? – Bersîva vê pirsî li r'û erdê li ber ç'avan e – k'ê destê xwe li pişta van sûc'karan dixe û wan xortê çê nav dike – helbet serokdewletê DYA bir'êz Donald Tramp! Ev ji k'u tê, nûner û şêwirmendên vî camêrî wî dixapînin, an ev t'erzê r'êvebirîya wî ye – wek ê k'arsaz-bazirganekî, û, lewra jî, ew nirxên mirovî û berjewendîyên welatê xwe wisa têdigihîje?!

Em naxwazin hema naha yekawa qîmetekî bidim van henûyan, lê li ber ç'avan e, ku ji hêla vê r'êvebirîyê va ne t'enê di kesê gelên k'urd, durzî û elewîyan da li dijî mirovahîyê sûc pêk tê, lê, her weha derbek a mezin digihîje berjewendî û r'ûmeta net'ewî ya DYA, wek welatekî gewre...

Û hinek têbînî jî ji konfêransa navborî û bersîvên hinek pirsan!

Piştî veger'a ji konfêransê me di gotara xwe ya "… Û gavek jî li ser r'êya berbi aştîyê û civaka dêmokratîk va" da di derbarê r'ojeva wê, dîtin û nêr'înên xwe li ser pirsên cuda vegotin û hinek nirxandin û analîz pêk anîn.

Wê demê di konfêransê da me bi t'aybet bal k'işand ser wê, ku:

– Pirsgirêka k'urdî ne pirsa ewlek'arîya dewletekê ye, ew mafekî hûmanîtar e, ê mirovî

ye. Ew mafekî xwezayî yê hemû gelan e, ê ku bi Tûzika R'êxistina Net'ewên yekbûyî jî hatye misogerkirin.

– K'urdistan mêtîngeheke navnet'ewî ye, ne ji ber wê, ku di nava çar dewletên herêmê da hatye parç'ekirin, lê ji ber wê, ku ew dewletana jî ji hêla xwe va bi dewletên gewre yên derva va girêdayîne – mêtîngehên wan dewletane.

– Ocalan girtî û r'ehîneyê T'irkîyayê nîne, ew girtî û r'ehîneyê navdewletî ye, lewra jî dewletên gewre divê di pirsa azadîya r'êberê gelê k'urd da bersîvdarîya xwe têbigihîjin û berpirsyarîya xwe cîh bînin.

– Gelê ku nexwaze bimire, hîç kesek nikare wî bikuje...[1]

Tevahîya vê axavtinê bi şêwazê vîdêoyî jî heye, yên ku bixwazin bala xwe bidinê û guhdar bikin, jêderka wê li jêrê ye.[2]

Ev û hinek xalên dinê tiştekî nû nînin, me jinûva Amêrîka venekirye! Ev hemû r'astî ne, ên ku divê ji hêla R'êxistina Net'ewên Yekbûyî (R'NY) û hêzên hêgêmon yên cîhanê va bên şopandin û pêkanîn. Lêbelê, R'NY werguhêr'î r'êxistina berîkan a dewletên gewre bûye (di vê derbarê da bi hûrbînî di gotara me ya "Vê carê Civîna Giştî ya R'êxistina Net'ewên yekbûyî mirovahî matma hişt" da heye[3]) û dewletên gewre jî, vê cîhanê anegorî berjewendîyên xwe yên mêtîngerîyê t'evdidin – bi şer' û dorpêç'an, bi dek' û dolab, êrîş û fişaran va!

Û li vira r'astîyek dertê holê: dema r'êvebirîya DYA bi hevk'arîya r'êjîma faşîst a T'irkîyayê fermandarekî DAÎŞ-î/HTŞ-î tîne ser desthilata Şamê, dema wî cîhadîyî vedixwînin Amêîrkayê (ji bo ku desthilata wî r'ewa bikin!), dest li pişta wî dixin û pesnê wî didin, lê r'êberê gelê k'urd bir'êz Ocalan ev bîstûhevt sal e girtî ye, li girava Îmralêîyê r'ehîne tê girtin, di wê r'ewşa goşangîrîyê da jî pirsên sereke bêyî wî nayên ç'areserkirin. Û, wek ku me di konfêransa navborî da gotibû, ew girtî û r'ehîneyê T'irkîyayê nîne, ew girtî û r'ehîneyê navdewletî ye! Lewra jî divê dewletên gewre di pirsa azadîya r'êberê gelê k'urd da bersîvdarîya xwe têbigihîjin û berpirsyarîya xwe cîh bînin.

Bala xwe bidinê, heya yekî wek Baxçelî (serokê Partîya Tevgera Net'ewperest û hevp'arê r'êvebirîya r'êjîma faşîs a T'irkîyayê!) li xwe mukur' tê, ku muxatabê wan ê ciddî Ocalan e... Ango, dîsa, çi gav tên avîtin, bêyî Ocalan nabin – bila ew dîsa wî wek r'ehîna bigirin û li derva hewl bidin r'engekî dinê bidin pêvajoyê, yek e, mîmarê wê Ocalan e!

Lê sîstêma mêtîngerîya navdewletî evê yekê nabîne, an naxwaze bibîne, ji bo wan îro girîng e, ku peyayên wan ên wek Colanî û Erdoxan bi wan r'a di nava bazarîyê da bin!

Û têbînîyek jî: demekê Baxçelî gotibû, ku Ocalan bi xwe jî naxwaze derê azadîyê! Û ji ber vê yekê di nava hinek derdoran da pirs û şiroveyên cuda r'û dabûn... Hemma, divê bê zanîn, eger bir'êz Ocalan tiştekî wisa gotibe, ewî dê her bi bonaya tiştekî gotibe, eger hinek pirs pêşnîyarî wî kiribin, û jê r'a gotibin, eger ew wan bip'ejirîne, wê demê dê derk'eve azadîyê. Û ewî ev r'edkirye!

15-ê sibatê di nav gelê k'urd û mirovahîya azadîxwaz da wek r'oja r'eş, r'oja dek' û dolabên navnet'ewî ya êi dijî R'êber Ocalan û gelê k'urd tê şermezarkirin.

Wan r'ojên dijwar û giran em jî bi r'êberê gelê k'urd r'a bûne, û di wê derbarê da me gotarek bi sernivîsa "Di nava ta û bendên komploya navnet'ewî da" weşandye, ew di p'irtûka me ya "Abdullah Ocalan. R'amana azadîyê, gelê k'urd û cîhan" da heye: r'ûp'elên 43 – 57.[4]

---

[1] https://www.amidakurd.net/ku/tekst/Û_GAVEK_JÎ_LI_SER_R_ÊYA_BERBI_AŞTÎYÊ_Û_CIVAKA_DÊMOKRATÎK_VA

[2] https://drive.google.com/file/d/1pzgo2lPVp0h4gtPPnCNKiIYII7OtavK0/view?usp=sharing

[3] https://www.amidakurd.net/ku/tekst/VE_CARE_CIVI_NA_GIS_TI_YA_R_E_XISTINA_NET_EWE_N_YEKBU_YI_MIROVAHI_MATMA_HIS_T

[4] https://amidakurd.net/ku/tekst/ABDULLAH_OCALAN_Ramana_azadîyê_gelê_kurd_û_cîhan

Mirov van hemûyan çawa têbigihîje, an çi navî lêbike?

Di DYA û Ewropayê da civînên astên bilind didomin, danîştinê, parlamêntoyan, kongrêsan û sênatoyan pêk tên, gotinên xweş jî di derbarê gelê k'urd û têkoş'îna wî ya lehengî a li dijî DAÎŞ-ê da tên gotin. Lê ji hêla dinê va hewlên wan ên ji bo r'ewakirina r'êvebirîya Şamê ya HTŞ-î/DAÎŞ-î didomin, dorpêç'a Kobanîyê jî wek xwe dimîne: dîsa gel dizêre, zarok ji birçîya dimirin, lê civînên wan didomin, hinek biryarên dêklaratîv jî tên girtin, ên ku k'îyê pêk bîne, nayê xuyan – ew jî wê demê, dema hêzên hevpeymanî bi ç'ek û teknîka leşkerî va li wir hene, wan dikaribûn ji wan hêzek a aştîp'arêz ji bo ewlekarîya bajêr banyana wir. Lêbelê – na! Çawa dibe, lê pilanên wan ên mêtîngerîyê, lê bazarîya wan a 5-ê r'êbendna 2026-an a bi HTŞ/DAÎŞ-ê û r'êjîma faşîst a T'irkîyayê r'a?!

Û ev dorpêç'a dê heya k'engê bidome?

Ev çi ye, ma wisa dibe, dibe ku dîroka cîhanê sûcekî weha yê li dijî mirovahîyê yê ewqas bêexlaq kêm dîtibe!

Wê demê di derbarê destpêka wan bûyeran da nirxandinek a me bi sernivîsa "Dîrok xwe dubare dike" hate weşandin, û di wê da me hinek analîz û nirxandinên dîrokî pêkanîbûn…[5]

Berê jî di cîhanê da hinek bûyer û pêşk'etin pêk dihatin, ku mirovê bi heş û sewdayê t'endurust nikaribûn tê bigihîjin. Lê îro, bi t'aybet jî, bûyerên ku di Sûrîyayê da pêk tên, di heşê mirov da cîh nabin: r'ewşek a obyêktîv li holê yê, lê hêzên derva dîsa wek xwe pêşk'evtinan diguhêr'in…

Baş e, em li hêlekî bihêlin, HSD dê-fakto endama Hevpeymanîya Navnet'ewî ya li dijî DAÎŞ-ê ye, lê mafên gelan, lê şaristanî, lê dadwerî, lê mirovî û mirovbûn û exlaq li k'u man?

Ma, dema Hêzên Hevpeymanîya Navnet'ewî li dijî DAÎŞ-ê ditêk'oşîyan, û HSD di xal û enîyên şêr' ên here germ da bû, xwîna xwe dirêt, bi dehhezaran p'akrewan dan, dema R'eqqa û Dêrezor ji hêzên DAÎŞ-î paqiş dikir, T'irkîya AKP/MHP-î ji hêlekê va li ber ç'avê hevpeymanîyan û di bin pozê wan da êrîş tanîn ser Efrîna k'urdî û ew dager dikir, ji hêla dinê va hêz û derfet dida kom û komikên DAÎŞ-ê, ç'ekdarên wê yên têkçûyî li bal xwe berev dikir, birîndarên wan derman dikirin û ji wan art'êşek a altêrnatîva Art'êşa dewletê – Artêşa xwe (ya AKP) sazkirye, nasnameyên (paseport) K'T dane wan…

Û hema wê demê, dema ku di hewl dihatin danîn, ku xalên peyman navbera R'êvebirîya Demkî a Şamê (ya HTŞ/DAÎŞ-î!) û HSD-ê da pêk bên, 5-ê r'êbendana 2026-an nûnerên DYA, Fransayê, Înglîstan, T'irkîyayê, Îzraîlê û Sûrîyayê di P'arîsê da bi peymanekê hinek herêmên başûrê Sûrîyayê didin Îzraîlê, bi wan mercan, ku hêzên hevpeymanî dê destûrê bidin hêzên Şaraa/Colanî (yên HTŞ/DAÎŞ-î) ku li ber wê va ew bi serbestî, bê astengî êrîşê bibin ser k'urdan – ew jî li ser gelê medenî li taxên Helebê yên Eşrefîyê û Şêx Meqsûdê … Piştr'a êrîşên wan li ser R'eqqa û Dêrezor domyan … Naha jî, ev derdorê mehekê ye, Kobanî di dorpêç'ê da ye, û Erdoxanê dostê Tramp jî li ber ç'avên Hêzên Hevpeymanî û Cîhana qaşo şaristanî sînoran digire û nahêle, ku alîk'arîya mirovî bigihîje Kobanê… Û hêzên hevpeymanî dîsa bêdeng in!

Weha, dîmenê mirovî yê Hevpeymanîya Navnet'ewî û hêzên hêgêmon ên cîhanî bi giştî ev e!

Lêbelê, cîhan t'enê ji van pêk nayê, û Amêrîka jî t'enê ne ew in.

Em hêvîdarin, ku ev sûcên li hember gelên k'urd, durzî û elewîyan pêk hatine, dê bên t'ewanbarkirin, ên kû di vî k'arê dijmirovî da r'ola xwe lîstine, dê bên darizandin, û mefên hemû gel û pêkhateyên Sûrîyayê dê bi destûrî bên misogerkirin.

Û Amêrîkayek a dinê jî…

(Li şûna paşgotinê)

Wek ku, me êdî li jorê gotibû, di Amêrîkayê da gelek dost û dilxwazên gelê k'urd hene, yên ku r'astîyê dibînin, û gelekên ji wan jî senator û kongrêsmên in, ên ku hewl didin di nava

[5] https://amidakurd.net/ku/tekst/DÎROK_XWE_DUBARE_DIKE

çarç'oveya erk' û p'eywirên xwe da biryarên piştgirîya k'urdan bigirin. Lêbelê, wek ku tê xuyan li derdorên Donald Tramp da hinek kes hene, yên ku dibin sedemên van xeterîayan. Gelo serokdewlet vê nabîne, an dibîne, lê ji nedîtîva tê?

Di vê derbarê da vêtêranê dîplomasîya amêrîkî, şrovegerekî konsêrvadîv û nivîsk'ar Con Bolton[6] nirxandinek a balkêş pêk tîne: "Ez bi xwe ne di wê nêrî'nê da me, ku eş-Şaraa daye bawerkirin, ku ewî dest ji paşer'oja xwe ya têr'orîstîyê û têk'ilîyên xwe yên bi Cebhet-an-Nûsrayê r'a berdaye. Li ber ç'avan e, ku T'irkîya alîk'arîyê dide wî. Bêyî alîk'arîya T'irkîyayê ewê îro li Şamê nînbûya…

Ez ne di wê bawerîyê da me, ku Tramp r'ola HSD-ê û cengewarênn k'urd têdigihîje, ya ku wan di t'unekirina xelîfeta têrorîstî ya DAÎŞ-ê da lîstine, an wê ya ku wan di k'arê p'arastina bi hezaran girtîyên DAÎŞ-î da lîstine.

Di r'astîya xwe da, cîguhastina girtîyên DAÎŞ-î ya li Îraqê, wek ku ez dibînim, gavek e berbi wê, ji bo ku bibêjin, ew r'ola HSD-ê êdî aktûêl nîne.

Min bi xwe çend caran bihîstiye, k'a çawa Erdoxan hewl dide Tramp bide bawerkirin, ku ew hemû hêzên amêrîkî ji wir vek'işîne û bi wê yekê HSD-ê bê piştgirî bihêle…

Bi dîtina min, mafên k'urdan heye, metirsîya wan hebe, ku îro di Mala Sipî da t'êra xwe mirovên wisa nînin, ên ku r'ola bir'yardar a HSD-ê di k'arê têkbirina DAÎŞ-ê da û wê r'ole, ya ku ew îro ji bo aramîya beşekî mezin ê Sûrîyayê, r'awestandina dagerkerîya T'irkîyayê û veger'a têr'orîzmê da dilîzin.

Tramp p'eywirên baylozê di T'irkîyayê da û yên nûnerê t'aybet ê bi pirsên Sûrîyaê r'a daye Barak. Û bi dîtina min, … ew wek bayloz bêhtir nunerîya berjewendîyên T'irkîyayê dike, ne ku yên Amêrîkayê, an ên hevpeymanîyên me, yên wek HSD-ê.

… Ez ne di wê nêr'înê da me, ku Tramp evê rewşê dibîne. Wisa ku, ev serdemek a p'ir' bi metirsî ye. P'ir' girîng e, ku gelê k'urd têbigihîje, ku ev r'ewşek a p'ir' metirsîdar e... Û, helbet, çi ku tê di derbarê DYA da, li vira p'ir' gelek dost hene …, û, bi dîtina min, girîng e, ku k'arên dîplomasîyê aktîvtir bikin…"[7]

Û agahîyeke balkêş jî! Rêzdar Bolton di bîranînê xwe da dinivîse: "R'asthatina bi Erdoxan ra – ew mijarek a cuda ye. Dema min guhdarîya wî dikir, û hert'im jî bi wî r'a wergêrek hebû, min wisa hîs dikir, qey bibêjî, ez axavtina Mûsolînî guhdar dikim, a ku ewî di balkona xwe ya bajarê R'omayê da pêktanî. Cudahî tek-tenê ew bû, ku bi têlêfonê ne ku Mûsolînî, lê Erdoxan diaxivî".[8]

15. 02. 2026. **Paytîgorsk/R'ûsîya**

---

[6] **Con Bolton** – di dema xwe da, salên 2018 – 219-an, şêwirmendê ewlekarîya netewî ê Donald Tramp bûye. Berî wê ew baylozê DYA bûye di Rêxistina Netewên Yekbûyî da, p'eywirên bilind di rêvebirîyên Rêygan, Corc Bşê mezin û Corc Bûşê biçûk da.

[7] https://youtube.com/watch?v=cZziFUsbbso&si=tDaVJxypMVLIj6O8; https://nupel.tv/bolt on-amerikanin-yeni-suriye-politikasi-kurtler-icin-riskli/

[8] https://regnum.ru/news/polit/2996769.html